



**Dr Nûredîn Zaza**  
1919- 1988

**Osman Sebrî**  
1905 - 1993

*Ji weşanên  
Partiya  
Yekîtiya  
Demokrat  
a Kurd li  
Sûriyê -  
YEKÎTÎ*

Xebat ji bo :

- \* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
- \* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
- \* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

**Rewşenbîr û nivîskarê Kurd  
REZOYÊ OSÊ Koça dawîn bar kir**

nivîskariyê de bi navê REZO hatiye naskirin, sala 1950î, li gundê **Degşûriyê** ji diya xwe bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Tenûriyê kuta kiriye û ya navîn û lîseyê jî li bajarê Qamişlo biriye serî. Sala 1980î, Endezyariya Petrolê ji Amojgeha Kopkîn li Moskoyê wergirtiye. Navê xanima wî Nîgar e, keça kesayetiya welatparêzî yê navdar birêz Samî yê Mele Ehmedê Namî ye. Du kurên wan bi Navê Salar û Rolan hene, û ew xwendina xwe li zanîngeha Istenbolê didomînin.



Ji salekê vir ve, wî gazinc ji êşa pişika xwe kiriye, piştî analîzan, hatiye zanîn ku nexweşiya penceşêr a malmîrat pencên xwe berdane hundirê pişika wî û ew guvaştiye!. Piştî kêferat û berxwedana derdora salekê bi vê nexweşiyê re, roja pêncşembê 04.03.2010Z, canê xwe yê pak sipartiye Xwedê û çavên xwe girtine.

Roja Înê 05.03.2010an, piştî nimêja nivro, termê wî bi beşdariya gelek rewşenbîr, zimanhez, welatparêz, siyasetvan û saziyên mafên mirov li gundê wî Degşûriyê bi xemgîniyeke mazin hate veşartin. Piştî veşartinê, birêz Konê Reş gotarek li ser kurtejiyana wî xwend, paşê, birûska serxweşiyê ya Kovara wî PIRS ku 17 salan xebat di desteya wê de kiriye hate xwendin. Birêz Arşek Baravî jî gotareke balkêş bi navê rewşenbîrên bajarokê Amûdê xwend û li **D.R.(10)**

**JI Ê MÊRTIR RE**

**Kovara RONAÎ**

**3**

**Bûyera Lehiyî**

**Hesenê Cumî**

**5**

**Danezana gerdûnî ya mafên mirovî**

**Dr. Kamîran Bêkes**

**6**

**Kuştina jinan**

**Salih Cefer**

**8**